Bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek Demokratîk û Federalî de

Hejmar: 74
31’ê Çiriya Pêşîn
Buha: 150 Tûmen

agiri

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

## Deftera Siyasî Ya PDK Îranê Bi Boneya Koça Dawî Ya Profesor Dr. Ordîxanê Celîl Peyamek Sersaxiyê Weşand



Daxuyaniya Defetera Siyasî Derheq Serbestberdana Kazim Darabî
3

Gefên Desthilatdarên Turk Bona Êrîşa Ser Herêma Kurdistanê ...




4

Konferansa Serhildana Simkoyê Şikak Di Sedsala Derbasbûyî De



5

MANDELEKIRIN Û TUNEKIRIN



9

Hevpeyvîn Bi Kurê Seydayê Cegerxwîn, Keyo Re



10

**Deftera Siyasî Ya PDK Îranê:**

# “EM HER CURE PÎLAN Û KOMPİLOYEK Lİ DİJÎ HİKÛMETA HERÊMA KURDİSTANÊ ŞERMEZAR DİKİN”



Biryara Parlamentoya Turkiyê ya ji bo êrîşa ser axa Herêma Kurdistanê û gefên berdewam ên desthilatdarên wî welatî, hêj rojeva siyaset û dîplomasiya navnetewî, Rojhilata Navîn û Kurdistanê ye.

Deftera Siyasî Ya PDK Îranê di vê derbarê de daxuyaniyek çapemeniyê weşand ku di rûpela 2 a vê hejmara Agirî de ketiye pêşberî we xwendevanan...

# Şandek PDK Îranê Serdana Mekteba Siyasî Ya PDK’ê Kir



Roja sêşem, 30.10.2007’an, şandek PDK Îranê bi serokatiya rêzdar **Mistefa Hicrî**, Sekreterê Giştî, **Mihemednezîf Qadirî**, endamê Polîtbîroyê û **Kawe Behramî** û **Çeko Rehîmî** endamên Komîteya Navnedî, serdana Mekteba Siyasî a PDK kir û ji aliyê birêz **Fazil Mîranî**, Sekreterê Mekteba Siyasî û hevalên Polîtbîroyê û serkirdayetiya vê partiyê ve bi germî hate pêşwazîkirin.

Rêzdar Fazil Mîranî kêfxweşbûna xwe û hevalên PDK bo vê serdanê da xuyakirin û di civîneke fermî de baseke siyasî li ser rewşa niha a Îraqê û Herêma Kurdistanê û têkiliyên siyasî ên wan bi hevalbendan û welatên cîran re pêşkêş kir û di basa xwe de qala van alozî û arîşeyan kir ku vê dawiyê ji aliyê dewleta Turkiyê ve bi hêceta hebûna hêzên PKK’ê li herêmên ser sînor ên deverên Kurdistanê derketine holê. Di vê derheqê de Mîranî da zanîn, siyaseta PDK û Hikûmeta Herêma Kurdistanê û hevalbendên wan, siyaseta diyalog û gotûbêjê bûye û hewil dane ku ew pirsgirêk ji rêya siyasî û dîplomasiyê ve bihên çareserkirin. Birêz Mîranî di doma wan hewl û xebatan de, basa hevahengî û alîkariya hêzên siyasî ên Herêma Kurdistanê, nemaze hevkarî û pêwendiya berbiçav a PDK û YNK kir û ev arîkariye bi helwesteke bibandor derheq pirsa Kurd hesiband û herwiha îşare bi siyaseta neteweyî û helwesta siyasî ya PDK Îranê di vê derbarê de kir.

Piştre rêzdar Mistefa Hicrî li ser rewşa siyasî ya Kurdistanê û guhertinên siyasî ên navçeyê û siyaseta maytêkirina hin welatên deverê di nav kar û barên Îraqê û bi taybet dijberîkirina wan bi hêcet û mihaneyên cur bi cur tevî destkevtên Herêma Kurdistanê basek pêşkêş kir û di gotinên xwe de îşare bi siyaset û helwestên PDK Îranê derbarê alîkarî û hevxebatî bi hêzên siyasî ên Kurdistanê re û nemaze Serokatiya Herêma Kurdistanê û Hikûmeta Herêma Kurdistanê kir û parastina vê destkevta neteweyî û niştimanî bi erkê hemû xebatkarên gelê Kurd zanî û amadebûna siyasî ya PDK Îranê ji bo vê alîkariyê û parastina wan armancên neteweyî xuya kir.

Piştî vê basê, rêzdar Mîranî spasiya hesta neteweyî û siyaset û helwestên dostane ên PDK Îranê kir û di dawiya vê hevdîtina dostane de her du aliyan li ser têkiliyên siyasî û neteweyî ên xwe tekez kirin.

## Deftera Siyasî Ya PDK Îranê Derheq Gefên Dewleta Turkiyê Ji Bo Êrîş Bo Ser Herêma Kurdistanê Daxuyaniyek Da Çapemeniyê:

# "EM HER CURE PÎLAN Û KOMPİLOYEK Lİ DİJÎ HİKÛMETA HERÊMA KURDİSTANÊ ŞERMEZAR DİKİN"

Gefxwarinên dewleta Turkiyê ji bo êrîşkirina ser Herêma Kurdistanê di çend mehê derbazbûyî de berdewam bûye, bi pejirandina biryara rêdayîn ji Arteşê re bona wê êrîşê rûçikek micidtir bi xwe ve girtiye û yê bûye sedema nigeraniya tev Kurdek welatparêz li seranserî cîhanê.

Turkiye sedema êrîşa han ji bo liv û tevgerên hêzên Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) li çiyayên sînorê Turkiyê û Kurdistana Îraqê vedigerînin. Bi liberçavgirtina wê rastiyê ku di heyamê salên borî de, Turkiyê çendîn caran ji bo wê meremê êrîşî ser axa Kurdistanê kiriye û hemû carê di operasiyon û êrîşên leşkerî ên xwe de rastî têkçûnê hatiye û negihîştiye tu encamekê. Niha bas ji dubarebûna vê ceribîna şikestxwarî dike.

Ev hêcet û mihanegirtina Turkiyê çi şik û gumanekê nahêle ku armanca sereke ji wê êrîşê têkdan û tevlihevkirina rewşa siyasî a Herêma Kurdistanê ye ku take herêma aram û biewle di Îraqê de ye. Dewletên desthilatdar ên deverê ku Kurdistanê bi ser wan de hatiye parvekirin, nikarin Hikûmeta Herêma Kurdistanê li hev tixûbiya xwe tab bikin û li pey pîlan û kompiloyan digerin ji bo ku vê destkevta gelê Kurd ji nav bibin, lewra jî dewleta Sûriyê bi awayekî fermî û Komara Îslamî a Îranê bi awayekê ne fermî piştgiriya wê êrîşê kirin û pejirandin.

PDK Îranê her ji destpêkê ve Hikûmeta Herêma Kurdistanê wekî destkevta siyasî û neteweyî a hemû gelê Kurd li her derekê bin û yek ji wan Kurdên Îranê hesibandiye û dê bizane



û êrîşa leşkerî a Turkiyê û meşandina her cure kompiloyeke neyarên gelê Kurd bi merema zirargihandin bi wê bidestxistiyê mehkûm û şermezar dike.

Em li ser vê baweriyê ne ku êrîş, şer û tund û tûjî nikare gelê Kurd rastî têkçûnê bîne û wan neçar bike ku dest ji daxwazên rewa û berheq ên xwe berdin. Ceribînên sedsalên derbazbûyî vê rastiyê diselimînin. Lewra çêtir eva ye ku ji bo çareserkirina wan arîşe û pirsgirêkan, rêya diyalog û gotûbêjên dostane bigrin pêşberî xwe ku encamên pirr baştir dê dişûn de hebin.

**Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê**
**Deftera Siyasî**
**23.10.2007**
**01.08.1386**

## Peyama Serxweşiya Deftera Siyasî Ya PDK Îranê Bi Boneya Koça Dawî Ya Profesor Dr. Ordîxanê Celîl

Em pê hesiyan ku mixabin Profesor Ordîxanê Celîl, yek ji kesayetiyên herî mezin yên zanistî ê Kurd, roja 21.10.2007'an di temenê 75 saliyê de li bajarê Lenîngrada Rûsyayê çû ser dilovaniya xwe û termê wî roja çarşem, 24.10.2007'an di rê û resmeke taybet her li wî bajarî hate veşartin.

Nêzîk 60 berhemên Ordîxanê Celîl bi Kurdî belav bûne ku bi zimanên Turkî, Swêdî, Fransayî, Almnî û Rûsî hatine wergerandin. Ji bilî wan, gellek berhemên çapnekirî ên din yên Ordîxanê Celîl di arşîva wî de bicî mane.

Ordîxanê Celîl, endamê Yekîtiya Nivîskarên Rûsyayê, Yekîtiya Nivîskarên Kurd, Enistîtuya Kurdî ya Parîsê, endamê Rûmetê yê Akademiya Zanyarî ya Îraqê, Serokê Saziya Kurd li Lenîngeradê û Profesorê çand û wêjeya Kurdî li zanîngeha Lenîngradê bû.

PDK Îranê bi vê boneyê behî û serxweşiyê ji malbata Ordîxan û malbata mezin ya Celîliyan û civaka nivîskar û wêjewanên Kurd dike

**Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê**
**Deftera Siyasî**
**25.10.2007**
**03.08.1386**


## Di Daxuyaniyeke Çapemeniyê De, Kongireya Neteweyên Îrana Federal Maytêkirinên Rejîmên Turkiye Û Îranê Di Nav Kar Û Barên Herêma Kurdistanê De Mehkûm Kir

Ligel hemû pirsgirêk û arîşeyên ku li encama maytêkirinên welatên biyanî di Îraqê de hatine pêş, partî û rêxistinên Kurdistana Îraqê tevî hebûna hemû pirsgirêkên han, ji cîhanê re dane zanîn ku federalîzm dikare bersiva tev pirsgirêkên siyasî, çandî û kulturî, aborî û civakî di welatên pirneteweyî de be. Di demekê de ku gelên belengaz ên Îraqê êxsîrê xurttirîn arîşeyên siyasî, civakî û aborî ên niha ne, gelê Kurd bi mifahwergirtin ji sîstema federalîzmê, Herêma Kurdistanê ku xwediyê qasek ji aramî û ewlehiya siyasî, civakî û aborî ye, weke mînakeke serkevtî ji sîstema federalîzmê di Rojhilata Navîn de nîşan daye.

Hêj cihwarên topbarana Komara Îslamî di herêma çiyayê Qendîlê de jinav neçûne, rejîma Turkiyê bi mihaneya hebûna hêzên PKK'ê bi êrîş û bicîkirina hêzên xwe li sînorên Bakûra Îraqê, dixwaze sîstema federal a di Herêma Kurdistanê de ji holê rake.

Du welatên cîran ên Herêma Kurdistanê yanî Îran û Turkiye di demekê de ji avabûna sîstema federalîzmê di Kurdistana Îraqê de hêrs bûne û ji her rêyekê ve dest avêtine darêtina asteng û komployan bona jinavbirina wê mînaka birêvebirina welat, ku bi xwe tevî gellek pirsgirêkên ku li encama siyasetên wan ên tepeserkerane û desthilatdariya take neteweyekê hatine holê, berbirû ne.

Desthilatdarên du dewletên şovînîst ên Îran û



Turkiyê parvekirina desthilata siyasî bi liberçavgirtina wekheviya neteweyî di wan welatan de, weke parçebûna welat mêze dikin û bi mihaneya parastina yekîtiya welat hovtirîn cinayetên dijî mirovî li dijî şoreşvanên wekhevxwaz ên neteweyên welatên xwe dimeşînin. Nahê haşakirin ku sîstema federalîzm a di welatê Îraqê de, weke strî û bilyeyekê di çavê şovînîstên Turkiye û Îranê de ye û wan çavê dîtina wê tune ye û her roj bi hêcetên cur bi cur û bi armanca jinavbirina Herêma Federal a Kurdistanê, gefan ji wan dixwen.

Desthilatdarên kevneperest ên Îranê baş dizanin ku heke desthilata siyasî ji destê girûpekê de were der û di nava gelên Kurd, Turk, Belûç, Ereb, Turkmen û Fars de, were parvekirin û her yek ji wan çarenivîsa xwe bidestve bigire, tu cihek ji bo tepeserkirin û tevxwaziya wan namîne. Desthilatdarên Turkiye û Îranê hêj naxwazin îtirafê bi hebûna neteweyên cur bi cur di welatên xwe de bikin çi bigihîje vê çendê ku sîstemên federalî di welatên xwe de bipejirînin.

Kongireya Neteweyên Îrana Federal ku daxwaza parvekirina desthilata siyasî di Îranê de û avakirina sîstemeke federalî, sekolar û demokratîk û dûr ji apartayda neteweyî, olî û zaneyendî di wî welatê de dike, li ser vê baweriyê ye ku sîstema han dikare neteweyên cur bi cur ên welatê Îranê ji bo jiyana aştiyane li dor hev bicivîne û berevajî yekîtiyên bi zorî, delîveya parastina yekîtiya wî welatî li cem wan pêk bîne.

Di qonaxên cur bi cur ên dîroka Îranê de û bi şahidiya wê, ewên ku dibin sedema parçekirina welatê Îranê, her ew rejîmên tepeserker û alîgirên nezan ên wan bûne ku ji bo man û parastina desthilata siyasî a xwe, siyaseta perçiqandinê li dijî neteweyên wî welatê bikar anîne.

Êrîşa hêzên Turkiye û Îranê bo nava axa welatê Îraqê, tevî vê çendê ku biryara wê ji aliyê Parlemanekê ve ku piraniya nûnerê wê alîgirên ferq û cudahîdanan neteweyî ne, li dijî yasa û azînên navneteweyî ye. Êrîşên han hêjayî mehkûmkirinê ne û hewcehî destbikarbûna bilezgîn a navendên navneteweyî ye.

**Kongireya Neteweyên Îrana Federal**
**18.10.2007**

**Defetera Siyasî A PDK Îranê Derheq Biryara Serbestberdana Terorîstê Komara Îslamî, Kazim Darabî, Ji Aliyê Dadgeha Almaniya Ve Daxuyaniyek Da Çapemeniyê:**

# “Serbestberdana bikujên Dr. Şerefkendî û hevalên wî binpêkirina nirxên mirovahiyê ye”

Roja 17’ê Îlona 1992’an, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê, Dr. Sadiq Şerefkendî, Fetah Ebdulî, endamê Komîteya Navendî û berpirsiyarê wê demê yê têkiliyên partiyê li derveyî welat, Humayon Erdelan Kadroê Partiyê û berpirsiyarê pêwendiyên PDK Îranê li Almaniyayê tevî dostekî partiyê bi navê Norî Dêhkurdî, akinciyê Almaniya, li xweringeha Mîkonosê li bajarê Berlînê bi fermana berpirsiyarên herî bilind ên Komara Îslamî a Îranê û li gor komployeke di pêşde darêtî de hatin terorkirin.

Dadgehek ku ji bo vekolîn li ser tawana bikujan li Berlînê pêk hat, di roja 10’ê Nîsana 1997’an, yek ji bikujên bi navê Kazim Darabî yê Îranî bi cezayê girtîgehê yê heta hetayî mehkûm kir. Lê niha dadgeha Almaniya mijûl e û dixwaze ku wî terorîstî ku di terorkirina 4 xebatkarên siyasî de dest hebûye, serbest berde.

Hêceta dezgeha dad a Almanyayê ji bo vê serbestberdanê eva ye ku li gor qanûna wî welatî, ew biyaniyên ku di girtîgehên Almaniyayê de hatine hepskirin, bi mercekê ku 2 ji 3’ê a heyamê hukmê wan bi dawî hatibe, dikare radestî welatên xwe werin kirin, ji bo ku dema mayî a cezayê girtîgehê di zîndanên welatê xwe de biqedînin.

Eva di halekê de ye ku Kazim Darabî û tawanbarên din ên vê dosyayê, her wekî kesên din ên bi vî awayî ku bi femana rejîma Komara Îslamî a Îraanê li derve an li hundirê Îranê wan tawanan dimeşînin, ji aliyê wê rejîmê ve ne tenê her bi gunehkar û sûçdar nahên hesibandin û nahên zîndanîkirin, belkî wekî wan kesan hisab ji wan re tê kirin ku erk û wezîfeyeke diyarîkirî ên xwe birêve birine û bi vê boneyê tên teşwîq û xelatkirin û pileyên bilind ên berpirsiyariyê bi wan tê sipartin.

**Di vê derheqê de em îlan dikin:**

Her çend serbestberdana Darabî wekî mohreyekî biçûk yê terorîzma Komara Îslamî a Îranê tiştekê ji girîngiya encama Dadgeha Mîkonosê li dor terorîstbûna wê rejîmê kêm nake, her di wê demê de me jêve ye ev karê dewleta Almanya û dezgeha dadê a vî welatî berevajî îdeayên wan derheq xebat li dijî terorîzmê ye.

Her wiha em nigeranê vê yekê ne ku ev karê hikûmeta Almaniyayê encama danûstandin û tevn û besta nepenî bi rejîma Komara Îslamî a Îranê re be, ku ev yeke dibe bêhurmetîkirin bi malbatên wan şehîdan û her wiha tev azadîxwazên Îranê ye ku dijî siyaseta terorîstî a Komara Îslamî û li destê serkut, pelçiqandin û terora vê rejîmê bêzar û mandî bûne.

Lewra em daxwazê dikin ku dewleta Almanya û dezgeha dad a wî welatî ji serbestberdana berwext a vî bikujî xwe biparêze û bi vî awayî alîkariyê bidin xebat û berxwedanê li hember terorîzma dewleta rejîma komara Îslamî a Îranê û piştgiriya hemû azadîxwazên dijî terorê di wî welatî de.

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Deftera Siyasî**
**28.10.2007**



Terorîst Kazim Darabî, yek ji bikujên Dr. Şerefkendî û hevalên wî

# Dema Ku Taqima Mela Hesen Restigar Li Ser Navê PDK Îranê, Daxwaza Peyamê Ji Bo Kongireya Xwe Dikin!

**Pskongireya wan – ku renge di pêşerojê de pêk were – dişîne, di pêwendiyekê de tevî Berpirsê Pêwendiyên PDK Îranê li Firansayê, ji wan re eşkere dibe ku ji aliyê taqima Mela Hesen Restigar ve, tûşî şaşiyê bûne. Lewra Jak Fat, endamê Komîteya Birêveber û Berpirsê Pêwendiyên Partiya Komonîst a Firansayê bi nûneratiya vê partiyê nameyekê ji bo nûnerê taqima Mela Hesen Restigar dişîne da ku şaşiya xwe serrast bikin. Ewa jî deqa wergerandî a vê nameyê ye ku bi zimanê Firansî hatiye nivîsandin:**

**Roj baş!**

Min niha fam kir ku saziya we tevî PDK Îranê ku me bi wan re têkiliyên xurt û dostane hene, biferq e. Çimku we jî her ji wan nav û nîşanan mifah wergirtiye ku PDK Îranê wan bi kar tîne, lewra em tûşî şaşiyê bûn. Eşkere ye ku armanca we jî mifahwergirtin ji van nîşanan bûye, eva jî karek pirr xirab û nebaş e.

Partiya Komonîst a Firansayê tu têkiliyek bi we re tune, lewma em daxwazê ji we dikin da ku ji vê peyamê mifahê wernegirin.

Ez kul û kesera xwe ji çêbûna vî karê şaş ku berpirsiyariya wê dikeve stûyê we, eyan dikim, çimku pir rohn e ku we bi mifahwergirtin ji wan zaniyariyên berê ên derheq têkiliyên me tevî PDK Îranê, karê han encam daye.

**Jak Fat**
**Endamê Komîteya Birêveber Û Berpirsê Pêwendiyên Partiya Komonîst A Firansayê**
**19.10.2007**

## Kurdan Li Swêde Meşeke Nerazîbûnê Li Dijî Gefên Turkiyê Bona Êrîş Bo Ser Axa Herêma Kurdistanê Lidarxistin



Roja şemî, 28.10.2007’an, Komîteya Hevkariya Hêzên Siyasî ên Kurd û Kurdistanî li welatê Swêdê, bi hevkariya Fedrasiyona Civatên Kurdistanî û Însiyatîva Kurd, xwenîşandaneke mezin li dijî gefên Turkiyê bona êrîş bo ser axa Kurdistanna Başûr bi beşdariya pitir ji 3000 kurdên her çar parçeyên Kurdistanê lidar xistin. Beşdarên meşa han serbarê hildana ala pîroz a Kurdistanê, gefên Turkiyê bo ser Herêma Kurdistanê mehkûm kirin û daxwaz ji raya giştî a cîhanê kirin da ku di vê derbarê de li dijî helwesta şerxwazane a Turkiyê bisekinin. Hêjayê gotinê ye ku çendîn partî û saziyên welatê Swêdê jî di vê xwenîşandanê de beşdar bûn û gefên turkiyê bona êrîş bo ser axa Kurdistanê mehkûm kirin.

# Gefên Desthilatdarên Turk Bona Êrîşa Ser Herêma Kurdistanê Her Berdewam In

**Siyamend Terbî**

Li doma gefên dewleta Turkiyê bona êrîşa ser Herêma Kurdistanê bi hinceta şopandina çekdarên PKK'ê, Receb Teyîb Erdoxan, Serok Wezîrê dewleta Turkiyê tekez kir ku welatê wî ji bo berxwedanê ji bo encamdana êrîşa ertêşa vî welatî bo ser Herêma Kurdistanê berhev dike û di wê derheqê de hewce nizane ku iznê ji çi kesêÎ werbigire. Erdoxan da zanîn ku Enqere bona derbazbûn ji tixûbên Kurdistanê û êrîş bo ser PKK'ê ji tu kesê/î iznê wernagire. Her li dirêjiya gefên dewleta turk bona êrîşa ser Herêma Kurdistanê 12 partî û saziyên Kurd û Kurdistanî û bo dijkiryar li dijî wê helwesta desthilatdarên Turk, bangewazek ji bo bîr û raya giştî li jêr dirûşma "bila em nehêlin Dewleta Turkiye rewşa Rojhilata Navîn aloztir bike", dane weşandin.

Di beşek ji wê daxuyaniyê, hatiye: "Ji bo bîr û raya giştî ron û eşkere ye ku armanca dewleta Turk, lêdana binke û bargehên PKK nine. Armanca sereke ya dewleta Turkiyê berlêgirtin ji xurtbûn û pêşveçûna Hikûmeta Herêma Kurdistanê ye. Generalên Turk gellek caran ragehandine û dibêjin ku: Hikûmeta Herêma Kurdistanê tirsek ji bo ser tenahiya neteweyî ya Turkiye tê hesibandin. Li gor bîr û bawera Generalên Turk û karbidestên dewleta Turkiye demekê gelê kurd bixwe qedera xwe diyarî bike, dibe tirs û gefek bo ser Turkiyê!! Di halekê de ku mafê diyarîkirina çarenivîsê yek ji mafên serekê ên neteweyan e û Hikûmeta Herêma Kurdistanê jî daxwaz û îrada Kurdên Kurdistana Başûr e".

Gelo dewleta Turk bi wan gefane birastî dixwaze êrîşê bo ser Herêma Kurdistanê bike? Eger êrîşekî han bihê kirin, armanc têkdana tenahiya Herêma Kurdistanê ye, yan derbe lêdan ji çekdarên PKK'ê tê hisêb? Gelo Turkiye dê bikaribe bi wê êrîşê dawiyê bi liv û tevgerên vê hêzê bîne? Gefên desthilatdarên Turk di wê Qonaxê de bi çi armancekê xurtbûn bi xwe ve dîtine? Dijkiryara bîr û raya giştî û neteweya Kurd li hember êrîşê han dê çi be. Bê şik her wek ku di bangewaza partî û saziyên Kurdistanî de hatiye, encamdana vê êrîşê tenê bi armanca ji holê rakirina, ewlehî û pêşveçûnên Hikûmeta Herêma Kurdistanê û têkdana ezmûna hikûmeta Kurdî li Îraqê ye, ne binke û bargehên PKK'ê. Renge em bikaribin vê yekê bibêjin ku take astenga li hember dewletên mîna Turk û Îranê, bona êrîş bo ser Herêma Kurdistanê, hebûna hêzên hevalbend bi rêberiya Amerîkayê di Îraq û Kurdistanê de ye. Ji ber ku êrîşa dewleta Turk bo ser Herêma Kurdistanê rast berevajî siyast û armancên dewleta Amerîkayê di Îraqê de tê hesibandin ku



Kurdistanê ku xwediyê Parleman û yasaya taybet bi xwe ye, wek parek ji Hikûmeta Federal a Îraqê dihesibîne. Hekene bezandina tixûbên Kurdistanê û binpêkirina serweriya axa welatekê, li cem wan tiştekî xwezayî tê hesibandin. Yekem armanca dewleta Turk ji bo xurtkirina gefan li dijî Herêma Kurdistanê di vê qonaxê de, zext û givaşanîn bo ser dewleta Amerîkayê ye, belkî ku ji vê rêyê ve bikaribe ber ji pejirandina gelaleya komkujî û qirkirina Ermeniyan ji aliyê hikûmeta Osmanî di Kongress a Amerîkayê de bigire .

Piştî pejrandina gelaleyekê ji aliyê yek ji komîteyên Kongress a Amerîkayê bona jinoysad hesêbkirina qirkirina Ermeniyan ji aliyê Hikûmeta Osmanî ve, desthilatdarên Turk bi tevayî bi vê yekê nigeran in û dixwazin bi her awayekê bûye, ber ji pejrandina biryara han di Kongressê de bigirin!!! Ji bo vê armancê çeka herî baş di destê wan de gefa êrîş bo ser Herêma Kurdistanê ye.

Armanca din a desthilatdarên Turk ji gefxwerinên xwe bona êrîşa ser Herêma Kurdistanê, kişandina Amerîka û hevalbendan bi taybetî peymana Atlantîka Bakur "Nato"ê ji bo şer li dijî PKK'ê ye. Hizra han ji ber vê hegerê di mejiyê desthilatdarên Turk de çê bûye ku PKK di nava lîsta partî û saziyên terorîstî ên Wezareta Karê Derve a Amerîkayê de hatiye cih kirin rojeva û welatên Ewropayê jî PKK'ê wek saziyeke terorîstî dihesibînin. Lewra piştî hatine rojeva Eniya teror û dijî Terorê, Dewleta Turkiyê wek endameke "Nato"yê, bi mifahwergirtin ji vê keysê dixwaze bi hêceta bi nav şer li dijî terorê! peymana "Nato", nemaze Amerîkayê tevlî şer li dijî hêzên PKK'ê bike. Hekene dewleta Turk baş dizane ku bi êrîşa ser Herêma Kurdistanê nikaribe hêzên PKK'ê ji nav bibe û dawiyê bi tevgerên vê hêzê bîne. Ji ber ku eva cara yekemîn nine ku dewleta Turk dest bi êrîşekî han dike.!! Her wek li bangewaza 12 partî û saziyên Kurd û Kurdistanî de hatiye, dewleta Turkiye di wan 25 salên dawiyê de 24 caran êrîşa kiriye ser Kurdistana Başûr, lê tu demekê negîhiştiye armancên xwe ku wê carê bigehîjê. Desthilatdarên Turk bi başî ji wê yekê haydar in ku hêzên PKK'ê mîna hêzeke kilasîk di cihekê de cihgir nebûne ku di eniyeke taybet de şer li dijî wan dest pê bike û dawiyê bi tevgera hêza navhatî bîne. Hêza han mîna hêzeke partîzan li her cihekê dikare derba xwe biweşîne û ji wir dûr bikeve.

Şaşiya herî mezin a dujminê Kurdan û yek ji wan dewleta Turk eva ye ku hêj nexwestine vê yêkê bi xwe bidin famakirin ku arîşe û pirsgirêka Turkiye tenê tepeserkirina PKK'ê nîne. Em bixwazin û nexwazin PKK nûneriya daxwaz û xwestekên parekî berçav ji gelê Kurd li Kurdistana Turkiyê dike. Eger gişt şervanên PKK'ê jî ji ortê hildin, divêt di hizra çareserkirina daxwaz û xwastekên 20 milyon Kurdan di wî welatî de bin ku êdî me jêve nine ku bi girtin, kuştin, tepeserkirin, dûrxistin û komkujî dengê azadîxwaziya wî gelî dli Turkiyê de, bêdeng bikin. Êrîş bo ser Herêma Kurdistanê, êrîş bo ser tev Kudan e ku bêşik xincî xisar, ziyan û haydana bîr û raya giştî li dijî dewleta Turk, tu destkevteke din ji bo wê dewletê nabe.

Em hêvîdar in, desthilatdarên Turkiyê dev ji gefên leşkerî berdin û dewsa topbaran û êrîşa leşkerî bo ser Herêma Kurdistanê, rêya diyalog û danûstanan hilbijêre û çareseriyeke bingehîn ji bo vê kirîzê di Turkiyê de ku daxwaz û xwesteka gelê kurd di wî welatî de ye, bigre ber xwe û du neteweyên Turk û Kurd bi hev re bi aştî û biraytiyê, jiyanê bidomînin.



# Konferansa Serhildana Simkoyê Şikak Di Sedsala Derbasbûyî De




**Dem:**
Şemî, 10’ê Mijdara 2007

**Cih:**
Universitet i Oslo
Gaustadalleen 23
Blindern, Informatikkbygget ved forskningsparken
Oslo / Norvêj

***Rojev:***

- Derwêş M. Ferho, serokê Enstîtûya Kurdî ya Brukselê, moderator û birêvebir
- Prof. Dr. Celîlê Celîl, Simko û mijara serxwebûna Kurdistanê
- Kakşar Oremar, rojnamevan, salên dawiya jiyan û Serhildana Simkoyê Şikak (ji 1920 heya 1930)
- Ebdullah Hicab, lêkolîner, di salên Serhildana Simkoyê Şikak de rewşa sosyo-politika Kurdistanê
- Dr. Huseyin Xelîqî, Şoreşa Paşatiya Destûrî li Iranê û bandora wê li ser Kurdistanê
- Dr. Xosrew Ebdullahî, dîrokzan, cihê Serhildana Simkoyê Şikak di polîtîka navneteweyî de
- Elî Simko, neviyê Simko, rewşa jiyan û malbata Simkoyê Şikak piştî şehadeta wî

***" Em pir baş dizanîn ku hinek netewe di cîhanê de hene ku hejmara wan nagehe çaryek(1/4)a Kurdan, lê ew gehiştine xweziyên xwe ku mafê otonomîyê ye. Li Elmanan binêrin ku çawa ev karê han di nava xwe de pêkanîne. Birastî ger netewa Kurd di Îranê de negehije mafê xwe, êdî mirin û neman jêre baştir e ji jiyan û mayînê. Di vê roja ku em tê de dijîn, dewleta Îranê bixwaze an jî nexwaze, em mafê xwe yê otonomîyê dixwazin. Êdî ev xweziya hemû mirovekî Kurd e û ji xelkê me re jî jiyaneke nû ye...”***

***“Îngilîz û Tirk her du ji bo çaresekirina pirsgirêka serxwebûn û serbestiya Kurdistanê derewan di gel me de dikin, ew me dixapînin. Înglîz dixwaze tevaya Kurdan mîna xulam û berdeyan ji bo armanc û daxwazên xwe yên çewt bikar bînin û bixebitînin, mîna meymûnan me ji xwe re bireqsînin û ew jî bi me bikenin. Ew dixwazin me li hemberî netewa me şermezar biken, ev ne karê min e, ez xiyanetê li gelê xwe nakem.***

***Tirk û Inglîz her du ji hev xirabtirin, lê ji herkesî zêdetir Kurd ji bona xwe xirabin, Kurd pişta hev nagirin, hînî xizmetkariyê bûne, baweriya wan bi xwe tune û mezinatiya hevdu napejirînin.”***

Peywendî û agahdarî
**Abdullah Hicab**
+47 99 52 07 13
**a-hejab@online.no**

**Fereydûn Elîxanî**
+47 91 16 04 42
**Enwer Kuhensal**
+ 47 40 01 07 24

**Enstituya Kurdî ya Brukselê**
+32 230 34 02
**kib@skynet.be**

Organîzasyon
Enstituya Kurdî ya Brukselê

Rue Bonneelsstr. 16-1210 Brussel-Bruxelles, Tel.:32.(0)2.230 89 30, Fax:32.(0)2.231 00 97

Bank: 853-8511270-37 of 001-2068530-81, NL. Girorekening 9030392

E-mail:
**info@kurdishinstitute.be**
**kib@skynet.be**,

Malper:
**www.kurdishinstitute.be**



# Awirek Li Ser Pirograma

## Partiya Demokrata Pêşverû Ya Kurdî Li Sûriyê

**ELÎ ŞEMDÎN**

***Silêmaniyê - 10.08.2007***

Di 14.06.1957’an de, **Partiya Demokrata Pêşverû ya Kurdî li Sûriyê** hate damezrandin. Weke yekemîn rêxistina siyasî ya kurdî li Sûriyê û partiya me dest bi xebata xwe ya siyasî û demokratîk kir, li ser bingeha rastiya hebûna parçek ji miletê kurdî di hundirê sînorê dewleta Sûriyê de û ew bi xwe di herêmên xwe yên dîrokî de dijî (Cizîr, Koban, Kurdax) û bûye parçek giring ji laşê welat û tê nasîn bi rûçikên netewî yên taybet, ji ziman û hestên hevbeş.

Partiya me xebatê dide ser milên xwe ji bo:

- *Çareserkirina pirsgirêka kurdî di hundirê sazûmaneke demokratîk a nûjen de ku maf û serbestiyên giştî bi kar bîne û mafên mirov biparêze û rehên demokrasiyê û wekheviyê kûr û asê bike û rê li ber sîstema tekpartî bigire û rê veke li ber serbestiya nêrîn û civîn û xwepêşandan û serbestiya rojname û çapemeniyê.*
- *Danîna destûrek nûjen ku wekheviyê di nav hemwelatiyan de pêk bîne, bê vegera li bingehên wan yên netewî û olî û ramyarî û divê netewa kurdwek netewa duyemîn li welat bête naskirin.*
- *Rêzgirtin li mafê hemû kêmnetewan li welat.*
- *Rakirina siyaseta zordestiya neteweyî ya ku li Sûriyê li dijî miletê kurd tê meşandin û hemû siyasetên din yên ne yasayî ku li dijî teybetmendiyên wî yên netewî tên bikaranîn ku dixwaze rehên wî ji kok de rakirin mina pirojeya:* ***kembera erebî*** *û* ***hejmartina awarte ya sala 1962*** *û ji bo cîbicîkirina  mafên netewî yên miletê kurd li Sûriyê yên siyasî, çandî û civakî.*
- *Rêvekirin li ber miletê kurd ku di sazkirina siyaseta welêt de hevbeş bibin û divêt di hemû dezgeh û birêvebir û komîteyên dadê, desthilatdarî, parlemanî û hemû rêxistinên din jî bê cudayetî û rêz li hebûna netewan di welat de were girtin û divê ku sazûmana rêvebirî li gor hebûna van netewan be.*
- *Rêdan bo neteweya kurd da ku zimanê dayikê û çanda xwe bikar bîne û pêkanîna wekheviyê di warê maf de, ji ziman û çanda û xwendina sereta û hunera gelêrî û danîna van xalan di pirogirama dewletê de û di pirojeyê wê yên hînkirinê de û rêdana çapkirina belavokên wêjeyî yên kurdî (kovar, pirtûk, rojname û wd...) û nîşankirina demekê ji bo belavkirina û ragihandina radyo û televîzyonê bi zimanê kurdî.*

Li ser roniya vê pirogirama siyasî, partiya me alîkar bû di civandin û daneheva tevgera kurdî li Sûriyê û partiya me derbasî çarçeva **Hevbendiya Demokrat a Kurdî li Sûriyê** bû û wilo jî di avakirina **Komîta Hevbeş ya Hevbendî û Eniyê** de beşdar bû ku di hundirê wê de niha 7 partiyên kurdî cî girtine ku bi hevre laşê sereke ji tevgera kurdî li Sûriyê bikar tînin û evan partiyan bi hevre di nav xwe de li ser yek nêrîna hevbeş ji bo çareserkirina pirsgirêka kurdî li Sûriyê bi şêwekî demokratî û dadewerî lihev kirin.

Di vî warî bi xwe de, partiya me alîkar bû li kêleka wan partiyan û bi hevbeşiya hêzên demokrat yên Ereb û Sûriyê yên ji dervî rêjîmê, ji bo avakirina çarçeva Dauyaniya Şamê wek çarçoveyek niştîmanî û giştî ji bo pêkanîna guhertinên demokratîk û aştiyane li welat li ser van bingehan:

- Pêkanîna sazûmanek niştîmanî û demokratîk ku bibe dergehek bingehîn di pirojeya guhertin û sazkirina siyasî de û dive ev guhertin bi şêwekî aştî û bi qonaxan be û li ser bingeha lihevkirinê avakirî be.
- Pirotestokirina ramyarên dîktatorî û yekane û qutbirî bi hemû pirojeyên tunekirinê re.
- Bawerî bi demokrasiyê wek sîstemek nûjen û xwedî bingehek cîhanî û li ser baweriyên serbestî û azadiya milet û dewleta dezgehî û guhertina desthilatê di riya hilbijartinên serbest û berdewam de ava bibe ku rê li ber milet vebe ku desthilatê binerixîne û bide guhertin.
- Parastina serbestiya hemû kes û komel û kêmnetewan di xwepênasîna ragihandinê de.
- Çareserkirina pirsgirêka kurdî li Sûriyê bi awayekî demokratîk û dadwerane ku wekheviyê bi temamî ji hemwelatiyên kurd yên Sûriyê re biparêze, mîna hemwelatiyên din ji aliyê mafên nasname û çand û hînbûna zimanê netewî û mafên din yên destûrî û siyasî û civakî û yasayî, li ser bingeha yekîtiya Sûriyê di warê gel û qadê de û divê ku nasname û mafên hemwelatiyê li wan kesan vegere ku ji wan hatine sitandin û girtina deriyê vê dosyê bi yekcarî re.
- Pêkanîna azadiyên giştî û sazkirina jiyana siyasî di riya yasayek nûjen ji partiyan re û sazkirina ragihandin û hilbijartinan li gor yasayên nûjen ku bike ji herkesî re azadî û wekheviyê peyda.

*** Endamê Komîteya Navendî ya Partiya Demokrata Pêşverû ya Kurdî li Sûriyê**

---

**Doma hevpeyvîna Kekê Keyo, ji rûpela 10’an**

**Seydayê xwe Xanî şa’irekî pirr ziman e.**

Belê; farisî,erebî tirkî…herî zêde jî erebî!

**Jixwe we gotibû, demekê xwestibû bi erebî helbestê lêke, hûn dij derketibûn!**

**Lê dixwazim li vir tiştekî bibêjim: bi qasî ku H. Qadirê Koyî demeke dûr û dirêj li Bakûr maye û li vir çûye ser dilovaniya xwe, û di gel ku Koyî jî mîna Seydayê min peyrewê Xanî ye, Koyî bi kurmancî helbest lê nekirine. Hişkiya şa’îr û edîbên sorî ya di biwarê bikaranîna zaravayê sorî de, em li cem Cegerxwîn nabînin. Ev yek ne nişaneya Kurdistanîbûna Seyda ye?**

Bavê min, karim bibêjim dengekî kurdî rojhilatî û hemdem bû.

**Hemdemitiya Seyda ne ya nîqaşê ye. Ew bi qasî ku kurd e, ev çend Filistînî, sbi qasî filistînitiyê evçene efrîkî ye. Helbestên wî yên bi navê ‘’Ey Heval Robson’, ‘Diyan Biyan Fû’û ‘ Em Şer Naxwazin’ ku di vê helbestê de li dijî dagirkirina Kûrê derdikevenîşanên vê yekê ne.**

Êêê heyran, tu ji min bêhtir bavê min nas dikî!

**Na Kek Keyo, ez ne bavê te; Cegerxwîn ji te bêtir nas dikim. Û dixwazim bibêjim di helbesta kurdî de bi Seyda re cure-helbesta ku meriv kare bi navê ‘**

**’Helbestnameyê’’ bi nav bike, dest pê dike. Ji helbestên dîwana wî ‘Agir û Pirûsk ’yek kêm yek zêde 22 helbestên bi vî rengî hene.**

Belê, ji şex û axa, ji dost û hevalan re bi vî rengî reşbelek dişandin!

**Weke ‘Nûbihara Biçûkan’ a Seydayê Xanî, Cegerxwîn jî pirr ehemiyetê dide zimên û zanîna zimên. Di ‘Zend Avista’ de malikin helbestê weha ne:**

Wejêne zimanê xwe ey xwendavan<br>
Nebûye Milet hîç kesek bê ziman<br>
*Wî bigihêne rêza zimanê mezin*<br>
*Bi nûsîn û ristin,bi kêş û wezin****

**Ku/eger rewşa ku cenabê te jî niha bi çavên serê xwe dibine, ku li ‘bajarê xewnan’ Ameda ber dilê dildaran, meriv ji sedî notûneh bi tirkî diaxivin; hûn ê ji me re çi bibêjin!**

Xebîneta Cegerxwîn! Karesat e û hew!

**Kek Keyo, pirs dawî: Demekê hate xwestin ku ji helbestkarên Başûr, Başûrê Rojava(Binxetê) Bakûr û Rojhelat Komisyona Xelata Cegerxwîn bêt saz kirin? Ew xebat di çi astê de ye.**

Ji ber ku H.H.Kurdistan bi navê Cegerxwîn rabûye, ez ê di vê biwarê de nikaribim tiştekî zelal bikim.

**Ezbenî ez spasdarê me, we wext veqetand, we xwe raht kir.. Lê sohbeta me lê hêjabû, ne?**

*Kek Arjen,ez spasiya te dikim bo qedirşînasiya te,bo dilsoziya te!*

**Weke peyva dawî…?**

*Hêvîdar im ku rojekê berî roja din em tev ji bindestiyê rizgar bibin!*

Ez jî bi hêviya we re…

***Agir Û Pirûsk, Cegerxwîn,Wş.Avesta,rp.188**<br>
****Aştî,Cegerxwîn,Wş.Avesta,Rp.201**<br>
*****Zend Avista,Wş.Avesta.Rp.55**

# Efûya Navneteweyî Îdamên Li Îranê Mehkûm Kir

Roja çarşem, 17.10.2007’an, 12 kes li Îranê hatin îdamkirin. Bi van îdamên dawî, hejmara kesên îdamkirî li Îranê gihîşt 250 kesan. Hejmara han fermî ye, lê hejmarên veşartî jî hene û bi zanyariyên veşartî, hejmara kesên îdamkirî gellek zêdetir e. Sala derbazbûyî hejmara kesên ku hatibûn îdamkirin, 177 kes bûn. Li gor hejmara sala borî û îsal, Îran bi îdama mirovan ber bi şikandina rekordê diçe.

Di 17’ê vê mehê de, 9 kes di girtîgeha Êvîn a Tehranê de, 3 kes li Şîrazê, 10’ê mehê jî 2 kesên Kurd li Sine hatibûn îdamkirin. Îdamkirina jinan pirsek din e ku têra xwe balkêş e.

Bo mînak: Mêrek 80 salî xwest ku dest bavêje namûsa Xatûneke 24 salî bi navê Fakteh. S, û xatûna 24 salî berevanî ji xwe nîşan da û mêrik di dema pevçûna dinavbera wan de hatibû kuştin. Lê berevaniya wê, jê re weke sûç hate hesibandin û xatûna 24 jî salî hate îdamkirin.

Îran yek ji wan welatan e ku zarokan îdam dike. Ev yeka li dijî peymanên navneteweyî ne. Îran erkê xwe a li hemberî peymanên navneteweyî bi cî naîne. Babek yek ji wan kesan bû ku temenê wî biçûk bû. Lê rejîma Îranê temenê wî li ber çav negirt û ew îdam kir.

Efûya Navneteweyî li dijî cezayê îdamê ye û îdamên dî Îranê de li dijî mirovahiyê dihesibîne. AI ji Îranê dixwaze ku ji nû ve pêdeçûnê li ser gişt biryarên îdamê bike û wan sivik bike. Mafê girtiyan û xweparastinê bide ber çav û daxwazan ji nû ve binirxîne.

Çavkanî: netkurd

# Ednan Hesenpûr Û Hîwa Botîmar Ji Hevdîtin Tevî Parêzerên Xwe Bêpar Man

Roja sêşem, 23.10.2007’an, daxwaza Mihemedsalih Nîkbext û Sîrwan Hûşmendî, du parêzerên Ednan Hesenpûr, rojnamevan û Hîwa Botîmar, çalakê civakî, ji bo hevdîtin tevî wan, ji aliyê Emcedî, dadverê bajarê Sine ve hate redkirin. Seba vê yekê pevçûn di navbera Parêzerên girtiyan û Emcdî de derket.

Hêjayî gotinê ye ku Emcdî, berê bi buxtana vê çendê ku du parêzerên navhatî bêhurmetî jê re kirine, doz ji wan re vekiribû.

Hewce ye were gotin ku navhatî seba livînên nebaş û xirab tevî parêzer û malbatên girtiyan, ketiye ber lome û gazindeyan.

Hêjayî gotinê ye dema ku Ednan Hesenpûr û Hîwa Botîmar ji bo eyankirina nerazîbûna xwe li derheq dana biryara darvekirina wan ji aliyê rejîma Komara Îslamî ve dest avêtibûn gireva birçîbûnê û ji ber vê çendê tûşî rewşeke nebaş a cismî û ruhî bibûn, Emcdî gotibû ku: “Canê wan li cem min tu buhayek tune ye û ez tenê biryarê ji Şahrûdî, Serokê Dezgeha Dad a Îranê ve, werdigirim.

# Li Welatê Swêdê Semînarek Li Ser Doza Jinan Hate Lidarxistin




Roja Şemî, 20.10.2007’an, semînareke azad li ser erkê mêran bi beşdarîkirin di xebata wekhevîxwaziya jinan û mêran û cîpêyê Femînîzmê di pirosesa xebata Nasiyonalîzma Kurdî li bajarê **Fêstirosî** a welatê Swêdê bi beşdariya birêzan **Ebdulreza Kerîmî**, endamê Ravêjkar yê Komîteya Navendî a PDK Îranê û **Şehla Debaxî** çalaka mafê jinan hate birêveçûn.

Semînar bi deqîqeyek bêdengî bona rêzgirtin ji canê paqij yê şehîdên rêya azadiya Kurdistanê, bixasmanî xatûna Zara Abadîxwah endama kevnar a YJDK Îranê ku havîna borî li welatê Swêdê seba nexweşiya penceşêrê çû ser dilovaniya xwe, dest pê kir.

Piştre xatûna **Şikofe Qubadî**, berpirsa YJDK Îranê li welatê Swêdê, raporeke kurt li ser çalakî û xebat û beşek ji erkên YJDK Îranê pêşkêşî beşdarên semînarê kir.

Di beşeke din de xatûna Şehla Debaxî, çalaka mafê jinan, baseke dewlemend û berfireh derheq hevpêwendiyên xebata wekhevxwazî ya jinan û xebata neteweyî pêşkêşî beşdaran kir. Xatûna Şehla li doma basa xwe de îşare bi vê yekê kir ku Nasiyonalîzm û Femînîzm ne tenê ji hev cuda ninin, belku zaf jî bi hev re girêdayî ne û dibe di pirosesa nasiyonalîzma Kurdî de cî pêyekê ji bo femînîzmê û mafê jinan were dîtin.

Di pişkeke din a semînarê de birêz Ebdulreza Kerîmî, Endamê Ravêjkar yê Komîta Navendî a PDK Îranê, basek li ser hewcehiya beşdariya mêran bi awayekî çalak di xebata azadîxwazane a jinan de, pêşkêşî beşdarên semînarê kir. Navhatî di doma basa xwe de îşare bi vê çendê kir ku ger di civakekê de jin azad û serbest nebe, ew civak jî nikare azad be. Lewra ger mêr heta bona bexteweriya xwe jî be, divê di pirosesa xebata wekhevxwazî ya jinan de bi awayekî çalak beşdar bin.

Di dawiyê de, beşdarên semînarê di panêlekî azad de bi pêşkêşkirina pirsiyar û bîr û ramanên xwe derheq mijarên han semînar dewlemendtir kirin.

# Yekîtiya Ewropa Di Daxuyaniyekê De Nigeraniya Xwe Li Derheq Binpêkirina Mafê Mirovan Di Îranê De Da Zanîn



Roja sêşem, 23.10.2007’an, YE’ê di daxuyaniyekê de nigeraniya xwe li derheq tepeserkirina berfireh a azadiya raman û pêkanîna astengan li hember weşanan di Îranê de, da zanîn û daxwaza azadkirina lezgîn a **Emadedîn Baqî**, berpirsê Civata Berevanî ji Mafê Girtiyan di Îranê de û sê xwendekarên girtî ên zanîngeha Emîrkebîr a Tehranê kir.

Di daxuyaniyê de serbarê baskirin li ser binpêkirina berfireh a maf û azadiyên girûpên cur bi cur ên di Îranê de, hatiye: “Yekîtiya Ewropayê daxistina rojname, kovar, bi taybetî nûçegihaniya Kar a Îranê (ILNA)ê û her wiha tepeserkirina berfireh a rojnamevan, wêblagnivîs û çalakên mafê mirovan ku bona bidestveanîna mfên xwe cehd û xebatê dikin, mehkûm dike”.

Her wiha daxuyaniya han ku ji aliyê Serokatiya Derve a YE’ê bi navê **Pirtixal** ve bi nûneriya 27 welatên endam di vê yekîtiyê de hatiye derkirin, ji aliyê welatên din weke, Norwej, Îslend, Okrayn, Moldawî û Komara Yogoslawiya berê ku endamên YE’ê ninin, piştevanî jê hatiye kirin.

# Jinên Kurd Bendewarê Rêbazên Kevneşop

**Amadekar/ Hemîd Muxtarî**

Gişt sîstemên civakî ên paremayî û olî di cîhanê de xwediyê armanceke wekhev in, ew jî parastina çand û deb û edetên paşverû û dûr ji sinc û pirensîpên mirovahiyê ên derheq jinan weke sinetkirina keçan, kuştina jinan bi hêceta parastina namûsê, zewicandina bi zorî a keçan, zewicandina keçan di temenê zarokatiyê de ji aliyê dayîk û bav û xizm û kesên wan û ... hemû ji wan deb û edetên paremayî ne ku mixabin civaka me ya Kurdan bi xwe ve digire.

Roj nine ku di civaka me de çend keç yan jin bi egerên cur bi cur xwe neşewitînin yan nedaliqînin yan bi her terzeke din dawiyê bi jiyana xwe neînin.

Her dema ku mirov guhdariya nûçeyan dike, yan seredana malperên Kurdî dike, tevî nûçeyên têkilîdar bi xwekuştina jinan bi awayên cur bi cur ber bi rû dibe. Yan roj nine ku jin bi destê mêran bi hêceta parastina namûsê nehên kuştin.

Bi rastî egera wan hemû bûyer û kirîzên civakî divegere ser çi?!

Emê çawa bikaribin xwe ji wan deb û edetên kevneşop ku îznê nadin civaka me ber bi civakeke nûjen û pêşketî ku têde mafê jin û mêran wek hev tê parastin, rizgar bikin?!

Berî ku bersiva van pirsiyara were dan, hez dikim bala we bo çend serhejmarî û nêrînên Civaknasên Kurd û pisporên vî warî bikşînin.

Civaknasa Kurd xatûna **Sirwe Hemecan**, derheq sinetkirina keçan dibêje: li gor lêkolînekê ku çend saziyên pêwendîdar li 160 gundên ser bi parêzgeha Hewlêr û Silêmaniyê, encam dane, eşkere bûye ku li koma 5920 jinan, 4155 ji wan hatine sinetkirin.

Malbatên Kurd weke edeteke civakî û olî, keçên xwe sinet dikin, ew bawer in ku sinetkirin dibe sebebê emegnasiya jinan derheq mêrên xwe, lê Feraz Baban yek ji pisporên warê zayînê, li ser vê baweriyê ye ku: tirsên sinetkirina jinan pitir ji xiyanetkirina wan bi hevjînê xwe, gefê li jiyana civaka Kurdan dike. Birêz Feraz Baban sinetkirina jinan weke jinavbirina bingehên jiyanê dihesibîne û dibêje: sinetkirina jinan dibe sebebê kuştina seha seksî ya wan û wê demê jin weke alavekê bona zarokbûnê tê bikaranîn, eva jî tevî yasayên Ola Îslamê û yasayên berevanî ji mafê jinan dijberî heye.

**Firaz Mihemed Selîm**, berpirsê Navenda Xwarezmî li bajarê Kerkûkê, dibêje: zû zewicîna keçan bûye sebebê dest kişandina %30 ji wan ji bo dawîanîn bi xwendinê. Herwiha saziya **Omînzîş**, piştî lêkolînekê eşkere kir ku sinetkirina keçan bi awayekî eşkere li piraniya bajarên Kurdistana Başûr û bi taybetî li deverên gundakincî tê encamdan.

Yek ji pizîşkên pispor di warê zarokbûnê di yek ji nexweşxaneyên bajarê Silêmaniyê de ku hez nekir navê wî were eşkerekirin, ragihand: %70 ew jinên ku bi armanca zarokbûnê tên, hatine sinetkirin. Wî herwiha eşkere kir ku zaf caran malbatên han, beriya kemilîna zarokên xwe, wan sinet dikin û hejmarek ji wan ji tirsa çûna heya û şerefa malbata xwe, li pêşerojê de?! Zarokên xwe ên keç li temenê 7 heya 9 saliyê de sinet dikin.



Di rastî de îro rojê mijarên weke çend jinî, sinetkirina jinan, xweşewitandina jinan, kuştina jinan bi hêceta parastina namûsê, zewicandna bi zorî ya keçan û ... bûye ciyê nigeraniya gişt saziyên fermî û nefermî ên parêzerê mafê jinan, gişt mirovên azadîxwaz û mirovhez û saziyên din ên sivîl ku ji bo pêşvebirina civaka me ber bi demokrasî û medeniyetê cehdê dikin.

Derheq xwekuştina keçan, Birêveberiya Saxlemiya Hewlêrê, li gor serhejmariyekê ragihand ku sala borî 1711 jin li parêzgeha Hewlêrê, cehd kirine ku xwe bikujin û hejmareke zaf ji wan jî, ji çekên sivik mifah wergirtine.

Divêt were gotin ku di civaka Kurdewarî de, jin hem ji ber kurdbûna xwe dikevin ber yasayên biferq û hem ji ber jinbûna xwe tên tepeserkirin. Heke em bixwazin xwe ji diyardeyên han bi giştî rizgar bikin, tenê rêçareyek heye, ew jî pêkanîna guhertinan di raman û bîrkirinên me de ne. Ji ber ku heya dema ku em wiha bifikirin ku jin rihbereke lawaz e û divê di bin desthilata mêran de be û nabe di piroseyên siyasî, aborî, civakî ûçandî de beşdar bibin, em nikaribin pêş bikevin.

# Dîmeneke Biçûk Ji Civakeke Saxlem



**Kavûs Ezîzî**

Heyamekê beriya niha ez li ber deriyê banka ew bajarê ku ez li wir dijîm, rûniştibûm û li benda wê bûm heya ku dora min dêt û herim nava bankê.

Min dîmenek pir balkêş dît, lewra jî min hez kir ku weke mînakekê ji bo xwendevanên hêja ên Agirî binivîsim.

Demjimêr 12’ê nîvro bû, xwendingeh xilas bibûn, xwendekar deste deste ber bi malên xwe dimeşiyan, lê dîmena herî balkêş bal min hatina 5 keçan bû ku bi hev re dimeşiyan.

Ew keç dema ku nêzîkî min bûn, silav kirin û derbaz bûn. 4 ji wan keçan ku temenê wan di navbera 14 heya 15 saliyê de bûn, ez dinasîm, lê nêzîk bankê xwaringeheke Kurdekî Bakûrê Kurdistanê heye. Diyar bû ku van keçan dixwastin xwarinekê bikirin. Lê çimku dîmen ji min re pir delal û balkêş bû, min jî mêzeyî dîmenê dikir. Wan berî mêzeyî lîsteya xwarinê kirin, piştre di nava xwe de pere kom kirin û dane keçek çermreş a Afrîqayî bû, wê keçê ji bo hemûyan xwarin kirî û piştre ber bi malê meşiyan.

Lê ewa balkêş bo min eva bû ku ew kê bûn?

Yek ji wan keçeke çermreş xelkê welatê Kongoyê li Afrîqayê bû û diya wê yek ji parêzerên naskirî yê bajar bû. Ew heyamê çar salan cînarê me bûn.

A duyan keçeke Peştû xelkê Celal Abadê bû, Celal Abad bajareke welatê Efxanistanê ye. Dayîk û bavê wê 2 salan tevî min di xwendingeha zimanê Danîmarkî de bûn û me hev du nas dikir.

A sêyem keçeke Kurd xelkê bajarê Serpêla Zehave bû ku li bajarê Romadiyê li Îraqê ji dayîk bibû, me bi hevre hatin û çûna malbatî heye.


A çaran keçeke Ereba Şîî ya Îraqê bû ku dayîk û bavê jî tevî min di xwendingeha zimanê Danîmarkî de bûn.

A pêncan jî keçeke Danîmarkî bû.

Xwendevanên hêja, renge eva tiştekî biçûk be, lê eva nîşana vê yekê ye ku civaka saxlem dikare mirovan bê liberçavgirtina ziman, ol, nejad, çerm, coxrafiya û ... bi hev re bike heval. Lê em weke Kurd di welatê xwe de biyanî ne. Neyarên netewa me, me li ser axa me bi biyanî dizane. Ez hêvîdar im ku rojek were ku em jî di welatê xwe de bi aştî û azadî bijîn û kes tu kesê/î bi biyanî nezanibe.

# MANDELEKIRIN Û TUNEKIRIN

ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com



Tunehesibandin û mandelekirina gelan, bişavtin û jixwebidûrxistina zarokên wan û zorandina hînbûna zimanê biyanî ji bo dahatûya mirovahiyê tiştekî xeter e. Ji aramiya pirsgirêkên heyî jî qet ne çareserî ye. Lewre çareserî azadiya zimanê gelan û perwerdehiyeke zanistî û pêşverû ya nûjen ku li ser hîmê yeksaniyê tê danîn e. Bi mandelekirina zimanê gelan re tunehesibandina wan, geşedana hêjahiyên wan ên çandî û civakî jî têne astengkirin.

Îro li gellek deverên dinê, di kesantiya hin gelan de gellek nirx û hêjahiyên mirovahiyê tên mandelekirin û binpêkirin. Her çendî ku pirsgirêkên dinê yên siyasî û aborî bandorê li ser rewşa civakê û derûniya wê dike jî, dîsa yek ji van pirsgirêkan, pirsgirêka perwerdehiyê ye. Fizîknasê navdar yê Elman, Albert Einstein dibêje: "Dahatûya welatekî, girêdayî perwerdehiya mirovên wî welatî ye." Rast e. Gava ku mirov dêna xwe dide welatên pêşverû û civakên şareza yên cîhanê, hemû bi girîngdayina perwerdehiyê gihîştine asta herî bilind.

Nirxên mirovahiyê hemû bi saya perwerdehiyê bi dest dikevin. Gava ku mirov perwerdehiya civakên şareza û pêşverû wekî mînak nîşan dide; tê gotin ku : "aboriya wan gellekî baş e." an jî "ew, welatên pêşverû ne." û hwd. Divê bê zanîn ku hemû civakên hemdem û nûjen, bi saya perwerdehiyê pêşve çûne/diçin. Û ew bi saya perwerdehiyê pirsgirêkên xwe yên aborî û siyasî çareser kirine/dikin.

Carekê li gellek welatên dinê bêhn û bêta perwedehiya zanistî nîn e. Heke pergaleke wan î perwerdehiyê hebe jî gellekî dûrî kirîterên navneteweyî yên zanistî û hemdemî ye. Perwerdehiya nûjen, pêşî mirovên azad, şareza û pêşverû digihîne. Li gorî krîterên perwerdehiyê yên navneteweyî, divê her zarokek bi zimanê xwe yê zikmakî perwerde bibe. Divê pêşî çand, dîrok û neteweya xwe binase û dide nasandin. Divê, hest û ramana xwe bi zimanê xwe derdibire. Divê xewn û xeyalên xwe bi zimanê xwe vebêje û binivîse. Divê bi dengê xwe, bi rengê xwe, xwe wekî kesayetiyeke resen û taybet, bi heval û hemsalên xwe bide nasîn. Divê gellek nirx û hêjahiyên xwe yên neteweyî bi zarokên cîhanê yên din re parve bike. Divê bi stran û folklora xwe, welatê xwe bide nasandin. Divê çanda gerdûnî binase, bi wê çandê re têkiliyê deyne û çanda xwe pêşve bibe. Divê welatên cîhanê û zarokên wan binase. Divê rêz û giramiyê bide tevê mirovahiyê. Divê kî şûna hestên dijminahiyê, nasdarî hestên aştî û biratiyê bibe. Divê ji bo pêkanîna lihevhatin û xweşikiyan dinê hewl bide û pêwendî û ragihandinên mirovî pêk bîne.

Heke ku zarok bi zimanê xwe yê zikmakî perwerde nebe û haya wî ji ziman, çand û dîroka wî nebe, dê ji zanava xwe jî bi dûr bikeve. Û dê xwe ji tu neteweyan nehesibîne. Zarok, digel ku bi vî awayî ji nirxên xwe yên neteweyî bi dûr dikeve, nêzîkî tu neteweyên din jî nabe. Zarokê ku pêmaya (mîrateya) çandî ya ku ji aliyê bav û bapîrê wî/wê de pê mabe, hatibe guhartin û tehrîfkirin, nê pêkan e ku bikaribe li nasnameya xwe xwedî derkeve. An dê ew zarok bê nasname bimîne an jî dê zanaveke bêxêr û bêkêr lê bar bibe. Ev jî ji bo zarok, tunekirin û mandelekirin e. Lewre zarokê ku neteweya xwe nas neke, dîroka xwe jî nas nake. Zaroka ku dîroka xwe nas neke, dê û bavê xwe jî nas nake. Yên ku dê û bavê xwe nas neke, xwe jî nas nake.

Hest û ramana her mirovî/ê îro li gorî bîrdoza fermî ya welatê wî/wê teşe û dirûv digire. Li gorî vê raman û mantalîteyê, çi kesên ku li ser xak û erdnîgariya xwe dijîn, ji aliyê bîrdoza fermî û kesên ku ew bîrdoz ji xwe re wekî rêbaz neqandine, "wekî dijmin" têne hesibandin. Çendî ku mirov ne ji wê neteweyê bin jî, li gorî zagon û bîrdozên fermî divê ku xwe wekî endamên wê neteweyê bibîne û bihishisîne. Nexwe dê ji aliyê civakê ve wekî kesekî ciyawaz, xayîn an jî dijmin û neyar bête dîtin. Ji bo wê, hemû zarokên civakên bindest, ji neçarî xwe dişibînin zarokên kes û hêzên serdest û dixwazin xwe wekî zarokekên wan nîşan didin. Bi vî awayî, her ku diçe, ew zarok ji zimanê xwe û girêdayî wê ji çand û huner û kevneşopiyên xwe bi dûr dikevein. Her wiha bi hemû kesayetiya xwe, ew zarok digel ziman û çanda xwe hin bi hin di nava çerxa bişavkeriyê de dimehin û tune dibin.

Îro li hemû deverên cîhanê gellek kes û gelên bindest ên ku bi mandelekirin û tunekirinê rû bi rû dimînin, hene. Li Rojhilata navîn ev tişt dijwartir e. Mandelekirin sûcekî mezin ê ku mirovahiyê serberjêr dike ye. Mafê tu kes û tu hêzê tune ye ku çand, huner û zimanê gelan mandele bike û tune bihesibîne.

Mixabin polîtîkaya cîhana serdest li gellek deverên dinê, digel hemû konetî durûtiya xwe didome. Nemaze jî li Rojhilata Navîn, pir hilum û bandoreke mezin dihêle. Polîtilaya hêzên serwer û dagirker a belavker, li ser vê erdnîgariyê pêşî bi tunehesibandinê dest pê dike; bi mandelekirinê didome û bi tunekirin û ji holê rakirinê bi encam dibe.

## Kaniya Helbestan

# Mihemmedo Lawo!
## (*oxir be bira Mihemmed Uzûn….*)

**Besam Mistefa**

Ji vê qerebalix û xirecirê, ji van gotin û derew û zariyan,
Tu xilas bûyî!
Ji cadûgeran, xwefiroşan, sêrûyan û sexteçiyan!
Ji siyasetmedaran, fêlbazan, têkçûyan, qehpik û dolarvanan,
Tu xilas bûyî.
Ji jimêryaran: emê çiqas pereyan sibe bidin hev?
Çend nêçîran nêçîr bikin?
Ji penaberiyê, sar û seqema wê.
Ji rojnama, kovar, xerîbiyan, bajar, welatan.
Ji şîretên şîretkaran.
Lêbelê, te nikaribû Ameda xwe bi xwe re bibe…
Destên te bê hêz bûn û Ameda te a dûrî nêzîk
Ji nav tiliyên te diherikî….
Dicle diherikî……hawar dikir: ax lo Mihemmedo lawo!
Firat diherikî…..
Amed ey Amed,
Îşev tê bê Mihemmedê xwe raze!
Mihemmedo Lawo!
Îşev tê bê Ameda xwe raze!
Mihemmdo!
Ziravo!
Dev li keno!
Teniko!
Ey Mihemmedo!
De raze bira!
Sibê tê zû rabe
Rûpel li benda te ne
Defter û pênûs bang li te dikin
Hêviyên jar û belengazan
Amed bê çavên te kor dibe:
Kê wê hûnik hûnik, hêdî hêdî di pencera
Zivistanê de lê binere?
Kê wê partiyên wê di landikê de bihejîne?
Kê wê bi dizî bigirî, da tu bikene?
Tu dikene,
Aniha,
Tu dikene:
Şofêrên Hewlêrê delodînin
Te dibin Amedê eger tu bixwazî!
Û welatê min û te di nav pêlên evîn û tozê de pêçayî ye.
Çend şehîd li vir ketin
Çend Evdal bi pey Zeyinkên xwe ketin
Çend hêvî berbi jorve ketin
Çend stêrk wekû te ji ezmanê welatê min ketin!
Tu dikene
Aniha,
Tu dikene.
Te mala xwe dît,
Xewek bê veqetîn.
Li ber dergehên Mêrdînê,
Li ber lingên Toros, tu tevlû vê ax û van çiyayan bûyî!
Ax!
Me ev ax li xwe mehir bikirana
Me têr têr ew biramûsana
Em têr ser sing û berên wê bigeriyana
Li çiyayên wê, gir û bajar robar û deşt û kaniyên wê!
Me çavên zarokên wê geş bikira
Paş evînek û şehîdekî,
Em bimirana!

# ''KUMBEDÊ GERDÛN İM EZ''

**Hevpeyvîn/ Arjen Arî**

*Berî ku wî nas bikim di helbesta ku bavê wî diyarî wî kiriye li navê wî rast hatim: **Keyo**! Keyo, ji pên keç û du kuran kurê biçûk yê Seydayê Cegerxwîn e. Di dîwana xwe ya yekem ya bi navê 'Agir û Pirûsk' de Seyda weha xîtabî Keyo dike:*

*Li dinyayê temaşe ke kurê min*
*Tu dê paşê binasî, xweş bibênî*
*Li jorê kumbedê gerdûn e Seyda,*
*Li jêrê xwe hemî tiştî dibênî*
*Tu daxwaza dilê min qet nizanî*
*Heta perdê ji ber xwe hilneyênî*
*Hemî kes dilbijokê qerş û toz e*
*Nikarê gewherê paqij derênî*
*Dibênim talibê dinya hemal e*
*Dixwazî wê li pey xwe rakişênî*
*Xelat çûye mirovê rast û gewher*
*Di pêsîra kerê reş daleqênî*
*Mirovên zane û hêja li cem me*
*Weke gewher di sergo de hilênî*
*Gelek jar û perîşan û belangaz*
*Heta dimrî tenê navek dimênî*
*Cegerxwîn destê rastî girt û kêşa*
*Dixwazî ko ji pişt perdê derênî*

*Keyo ji hêla bejn û bal û durivê xwe ve hima hima bavê xwe ye. Herî zêde çavên wî li yê bavî çûne. Di gel hemerengiya çavan, awirtûjî û çurisîna di çavên Seyda de, di yê Keyo de nabînim.*

*We zêdetir di meraqê de nehêlim: Keyo heftê salî ye, biçûkê birayê xwe Azad e. Azad li Soviyeta Kevn Qanûna Nêvdewletî xwendiye, lê ji ber ku teza xwe ya doktorayê li ser qanûna Dewleta Sûriyeyê amede kiriye, doktorayê nadinê, ew jî ji wir derbasî Swêdê dibe. Keyo ji salên 80yî de bi malbatî li Swêdê dimîne, niha bi boneya çapkirina du çîrokên bavê xwe''Cîm û Gulperî' û 'Reşoyê Darî'' ku ji aliyê Weşanxaneya Lîs ve hatine çapkirin, li Amedê ye. Ew di çarçoveya 7'emîn Festîvala Çand û Hunerê de beşdarî bernameya bi navê ''Hewara Ehmedê Xanî/Kilasîkên Kurdî'' bû. Di bernameyê de qala jiyan û berhemên bavê xwe kir û bîranîneke xwe vegot:' Rojekê Seyda jê re helbesteke xwe yi ku bi erebî daniye jê re dixwîne, piştî ku bavê wî xoşxwanê diqedîne, Keyo li bavê xwe vedigere dibêje, ''ev çiye bavo! Evqas helbestvanên ereb hene, tu erebî?*

*Me jî hatina xweşkur Keyo'yê Cegerxwîn delîve dît û me xwest em hevpeyvînekê pê re bikin.*

**Arjen Arî:Hêja tu bi xêr hatî Amedê, bajarê xewnan!**

Keyo Hesen: Xêrindar bin, her hebin!

**Ezbenî cara çendê ye ku hûn mêvan in li Amedê?**

Cara duyê.

**Bi kurtayî be jî me li jor qala we kir, lê hûn dixwazin tiştekî din bi ser yê ku me gotine vekin?**

Belê, sedemekî din ê li wirbûna min; Filmê Dokumanter e, ku ji hêla Kawa Akreyî ve tê amedekirin…Wezareta Rewşenbîrî ya Hikumeta Herêma Kurdistanê îsal bi amedekirina Festîvala Cegerxwîn ve radibe û ev film li ser jiyana bavê min Cegerxwîn e, dê di Festîvalê de bê nîşadan.

**Sala îsal?**

Belê belê, îsal.

**Kîjan heyvê?**

22'yê meha 10'an yanî 23'emîn salvegera wefatkirina Cegerxwîn! Her weha; Hikûmeta Herêma Kurdistanê Wezareta Rewşenbîrî biryara vekirina sentereke bi navê Cegerxwîn wergirtiye. Ji bilî vekirina navêndê; di çarçoveya Festîvalê de peykerekî bronz yê Cegerxwîn li Parka Azadî/Samî Evdirehman dê daçikînin!

**Di çarçoveya salvegera 22'emîn de Festîval, peykerê Seyda, filmê dokumanter,vekirina senterekî bi navê Cegerxwîn …xuya ye gellek mêvan dê beşdar bibin?**

Li gor agahiya komîsyonê li dor 250 kesî, belku zêdetirr



**Kek Keyo, kurê Seydayê Cegerxwîn**

**Baş e ku em werin ser pirseke din ji malbata we, piştî Seyda kesek bi kar û barê edebî û huherî rabûye?**

Kêm, neviyeke wî berê xwe daye hunerê.

**Kîj nevî?**

Hozan, qîza xûşka min a li Dêrika Binxetê.

**Ez hêvîdar im ku ji malbata we gellek kes bidin ser rêya Seyda.**

Ne bawer im. Rabin jî kesek ji me nikare weku Cegerxwîn deng vede?

**Ez jî bi baweriya we re me û bipirsim ji we:Çend berhemên Seyda yên neçapkirî li ber destê we ne.**

32

**Weewww..32?**

Belê belê 32.

**Hemû helbest in?**

Na, têkel in. Dîwana wî ya yekem ya wenda mirovekî kurd ku li Almanya penaber e, got' bavo ev ne malê min e, yê we ye', û ji me re hinart. Ez niha li ser vê dîwanê dixebitim; ku destpêka helbesta Cegerxwîn e…navê dîwanê jî ''Rewşen'' daniye!

**Mala wî ava be!merivekî dilsoz bûye.**

Em jî spasiya wî dikin ku ev berhem derxist ronahiyê.

**Baş e, 31 berhemên mayî?**

Rêziman in, Dîrok e, Pend û Şîret in, Çîrokên gelêrî yên ku dane hev, Çîroka stirana Hesenê Mûsa ye û yek jî destûr e.

**Destûra çi?**

Destûra Kurdistan.

**Yanî; mîna Seyda zanibe û bawer kiribe ku dê rojekê Kurdistanek ava bibe, destûr amade kiriye?**

Belê belê, him jî xal bi xal.

***Li wir em bi hev re dikenin. Ez jî ew ji bîhnekê bêdeng dimînin. Bêdengiya me herduyan jî li ser Destûrê, tîrr dibe, ez destê xwe direjî pakêtê dikim, radihêjim çixareyekê, paşê lê vedigerim.***

**Hesarê…hûn qet çûn Hesarê?**

*Tevî vê carê du caran.*

**Merivên we mane li gund?**

*Xalanên me û hin pismam!*

**Ez çûme Kercewsê, lê mixabin min Hesar nedîtiye, ne Cehinnem û ne jî Çêlekê! Lê li gorî helbestên Seyda, Hesarê gundekî bi av û kanî, bi darûber, şên û bi şînahî ye. We ye?**

Na, niha ne li gor ku ji me re bahs dikir e. Dema ku ez çûm gund, dîmenên ku bi gotina bavê min re di ser û xiyala min de mabûn, û gundê ku min lê dimeyzand, ne eynî tişt bûn.

**Weke çi?**

Weke ne çi? Di gel yek du avahiyên betonî, gund kavil e. Dar û ber hima hima hatine qirê. Çi devî, çi yên fêkî…bi taybet yên fêkî kêmtirr dixuyan, Û av jî ne weke ku di hişê min de mabû; boş bû. Bavê min digot nizanim çend aş li ber digeriyan? Bi dîmenên ku îro min dîtin ez pirr êşiyam.

Nexasim xaniyê kalê min…yê ku bavê min tê de ji dêya xwe bûye; niha kavil e. Na na, ne kavil e; şûna wî jî naxuyê! Hin merivên me rabûne ji nû ve ji xwe re xanî li şûnê ava kirine.

**Yanî wisa dixuyê ku Hesarî hêj ji hêjayiya Seydayê Hesarî Cegerxwîn bê hay in?**

Bê hay û hew? Ji merivan hinekan digot qey em hatine doza milkê xwe li wan bikin, welê rêş reş û bi şik li me dinêrîn.

Li ber mekevin..ji bîr mekin ku kurê Osman Sebrî bi destê merivên wî yên li gund, hatibû kuştin. Jixwe ji wê bûyerê bi şûn de Mam Osman Bakûr jî, herêm jî li xwe herimand!

***Piştî vê diyalogê em herdu jî heman keserê vedidin, lê wer dixuye ku Keyo ji min bêtir tengav e, bi dengekî mişt gilî:***

***Yanî ji hêlekê de rûmeta welatekî be, li hêla din bila gundiyên te xaniyê te hilweşînin, nikaribin kevlê xaniyekî***

***biparêzin?***

Belê, tu mafdar î. Li gor ku tê gotin helbestvanê mezin rûmeta gelê Eleman Gothe, rojekê ji mêvantiyê vedigere, mîz zorê didiyê, ew jî hima bi dîwarê hewşa xwe de dimîze. Gundiyên ku Gothe nas nakin, lê zanin dîwarê ku ew kes pê de dimîze, hêtê hewşa Gothe ye; li mêriv disekinin û bi ser de diqîrin:

'Tu fedî nakî kuro! tu bi dîwarê Gothe de dimîzî', dibejin.

Gothê vê bûyerê weke rûmetdayînê, li gellek deran bi coş tîne zimanû dibêje tiştê ku ez ê her pê dilşad bim û ji bîr nekim ev bûyer e. Seyda Gotheyê kurdan e. Bi helbesta xwe her bangî gundî û pale û karker û kedkaran dikir. Yekîtiya wan dixwest, azadiya wan dixwest, mafê wan dianî bîra wan...Gundiyên ku Seyda bi rêya helbestê vedixwendin qada şer, ne yê axê; xaniyê Cegerxwîn dirûxînin!

**Keyo li vir, dibêje:**

Weke ku tu jî pê dizanî, bavê min qet welatê xwe terk nekir!Erê li Swêdê mir, lê ew di nava gelê xwe de, li rex qewmê xwe, li dij dujminê xwe, ma! Azara ku wî xwariye, û pê re me jî...Xweda zane.

**Kek Keyo, baş zanim. Sala 1976'ê ez hatim serdana Seyda. Bi Kazimê Golî re. Xaniyê we yê ji kerpîçan, ban-ax, bi beşt û mirdiyaq qet jî bîra min neçû!**

Li vir, Keyo zîq li min dinêre, dibêje. "76'an ez li Şamê bûm.

Na xwe tu hatî mala me?Belê...havîna 76ê. Saetekê pirtir li gel Seyda mam.Ew rodroşambirê ku herdem di sûretên wî de dixuyê, lê bû. Me bi têra xwe sohbet kir. Wek ku kurd dibêjin ji aş û kaş! Lê min newêriya ku ji cenabê wî re bibêjim, "Seydayê min, ez jî helbestê dinivîsim.'

Di xatirxwestinê de, min xwest destên wî ramûsim, ew li hember derket, û got "Ma ez evçend kal im? Were rûyê min! Wê demê jî porê wî mîna berfa Sîpên sik î spî bû. Lê, tayek jî neweşiya bû. Li ser xwe bû, bi coş bû, bi hêvî bû...Bi gotina xwe ya li devê derî, ez bawerim min ew xemgîn kir!

**Te çi jê re got?**

Min bi xemgînî û dengekî uzirxwêz, got" Seyda li me megire...vî milletî efû bik! Xweda temenekî dirêj bexşî te bike, lê dema tu mir, bi ahd em ê qedrê te bizanin!

**Bavê min çi got?**

Bavê te şaşmayî, got, ''kuro tu ji kû dizanî?'.

Min serê xwe berda ber xwe, û min lê vegerand,'zanim Seyda zanim!'.Û min û Kazimê Golî me ji mala we da rê.

**Belê kek Keyo, ku em werin pirseke din ji cenabêt e bikin: Li gund li Hesarê di vê çûnê de hûn rastî merivina ku Seyda nas dikirin, bîranin wan li gel hebûn, rast hatin?**

Na bi Xwedê! Merivekî bi navê Mihemed Emîn hebûye, ew jî ne li gund bû!

Yanî hûn ji vê hêlê de destvala vegeriyan?

Hima bêje destvala...Lê Kawa Akreyî dîmenên xweş zept kirin. Gund û hawîrdora gund, rêya ku em tê re çûn û hatin bo min û hevala in jî geşteke cuda bû ...

Wekî din, di çû û hatinê de hûn rastî bakêşiyin din nebûn?

Li Elîhê/Batmanê.. Şaredariyê parkekê bi navê helbesta bavê min; "Kîme Ez" vekirine.

Mixabin navê hebestê şaş li parkê kirine.

**Ew çawa dibe?**

Êêê navê helbestê ''Kîme Ez"e. Wan navê parkê kirine ''Kîne Em". Xwedê giravî Şivan Perwer ji wan re wisa gotiye.

Ez bi bîr tînim, di salên 79-80yî de Şivan helbesta ''Kîme Ez" weke ''Kîne Em ''distira! Li çar hêlê gerdûnê, muzîkjenek bêyî destûra helbestvan ango guftekar, nikare yek ristê biguhere. Lê ev yek hêj di nava kurdan de durist nebûye, kek Keyo!

Ez bi te re. Lê belê mirovekî mîna Şivan divêt ne mîna mirovekê ji rêze tevbigere; eger Şivan siyaneta Cegerxwîn negire, em ê çawa karibin gazincan ji Hesariyan bikin?

Hey ku peyv hatiye ser stiran û muzîkê; çend xoşxwanên Seyda bûne stiran?

Em nizanin. Me carekê bi rêya înternetê bang kir wan kesên ku helbestên Cegerxwîn kirine stiran, deng ji kesekî nehat, ango kesekî deng nebir xwe!

**Kek Keyo!**

Belê heyran!

**Ez weke helbestvanekî ku xwe peyrewê Cegerxwîn dibîne, dibêjim, Seyda ne tenya ''helbest ji ezmana daxist erda", ne tenê zor da qalibên heyî yên şêwaz î şi'ira Dîwanê; ne tenê zimanekî sivik û zelal û fesîh hilgirt helbesta kurdî; ne tenê çîrokên menzûm nivîsandin; muzîk, mûzika kurdî jî dewlemend kir!**

Êêê bavo, tu helbestvanî, û tû ji min re dibêjî, ''tu kurê wî bî, ez naviyê wî me!

**Kek Keyo, bi baweriya min wek nimûne, hozanên ku deng dane helbestên Seyda, yanî yên ku bi miqam û usûl xwendine, bi miqamê Seyda yê helbesta wî xwendine. Bi gotina fesih;miqam ne miqamê wan e; yê helbesta Seyda ye. Ji ber ku,weke mînak; helbesta ''Kîme Ez"ya ''Şev Çû",' Ay Lê Gulê "Hey Pale", "Gufiroş'û hwd. bi miqamekî din nikarin bên xwendin.**

Kek Arjen,di vê warê de tu xweş dibêjî, dên dikişînî bi ser tiştine balkêş de, lê ez nikarim tiştekî vebêjim!

**Baş e Kek Keyo, cenabê te qet guh nedaye dengê helbesta Seyda?**

Belê, çawa!

**Êêê baş e, wê gavê ji kerema xwe careke din guh bide helbesta ''Kîme Ez" a ku Seyda bi dengê xwe gotiye; û ji vir...ku em bi pirsekê dagerin ser hêlên taybet yên Seyda Cegerxwîn û bibêjin Cegerxwîn bavekî çawa bû, tu yê ji me re çi bibêjî?**

Weke ku şa'irekî baş bû, bavekî baş bû jî. Têrhez bû.Mîna hemû bavên kurd, ku heza xwe nikarin eşkere bikin, wî jî bi peyva xwe, bi avirên xwe, bi nêrîna xwe û destên xwe em bi hezê dihesandin. Erê em zarokên wî bûn, lê helbest delalê ber dilê wî bû. Mafdar bû ku ji me bêtirr ji helbestê hez bike, Û jixwe li mal zêde venediheviya. Nigekî wî li Şamê yek li Bexdê bû!Dema ku li mal vediheviya jî herî pirr bi helbestê re wextê xwe diborand. Ku ne wisa bûya, karîbû evqas dîwan û xebatên din li dû xwe bihişta? Ez bi rûmate ku ji gelê xwe û me re hiştiye serbilind im!

**Siyaset jî dikir di ber helbestkariyê re, ne ?**

Erê bavo! Şaîrtî, siyaset, tevgera roşenbîrî, civakgerî.

**Hin kurtepistî têne levandin?**

Weke çi?

**Wek ku ji pîrekê/ jinê pirr hez dikir? Weke ku di civatê de deqarû bû, ji kesekî danedixwar!**

Herçî mesala jineyê...rast e, bavê min jin weke kaniya heyatê didît, û pirr qedir dida jinê.

**Li vir ez peyva Keyo dibirim, dibişirm û dipirsim: Na xwe, ez ne neheq im ku jê re dibêjim ''Seydayê Evînê!'**

Tu ji erda heta ezmana mafdar î. Wî bi qasî ku ji welatê xwe hez dikir, evçen heza xwe bi rêya helbestê rayî jinê daye, şanî karker û cotkar û kedkarên kurd daye. Jixwe di dereke vê sohbetê de, te gotibû hez hêz e! Hez ta vehêsana/bîhna dawî dîwarê ku xwe disipartiyê bû.

Belê belê, Li Swêdê jî helbestên evînî ristin, û reqifandin hev li ser şoxitî şepaliya spehiyên Swêdî. Di dîwana 'Aştî' de em li helbestên ku li Stokholm û bajarên weke Ûbsala ristene rast tên. Ne hew evîn; li Swêd bi tîrên helbestê êrîş biriye ser gorînkariya leşkerî ya ku di sala 1980yî de qewimî.Tiştekî seyr e, dibe ku gellek xwendevanên û dildarên helbesta Seyda nizanibin, bi vê delîveyê ez dixwazim bêbijim ku Seyda, jinê weke ''nîv-xwedawendekê" dibîne. Di dîwanên wî de helbêstên wî yên çêj û bîhn-evîn bêjimar in. Jin/yar/dildara Cegerxwîn lêv erxewanî ye, bejin selwî ye, dêm bihar e, por û kezî reşmar in, her du sêng sêv in, ava ku ji lêvan wexwe şerab e, mey e, ava tirî ye; gerden bostan e, zêr û zîv e, bi kurtayî mê ye, sembola hezê ye...Digel ku di gellek ristan de jin 'şah' e, 'badîşah' e,'siltan' e; 'keyxusrewa' wî ye di helbesta li jêr de cihê jinê berztirr dike:

*Gava diçin cem malekê*
*Yan jî diçin sersalekê*
*Jinê bidin pêş xwe bira*
*Dibî tu bêjî min:çira?*
*Ez ê bibêjim dê ye jin*
*Sunda me herdem pê ye jin*
*Navê wê nîv navê Xwedê*
*Xwedê du nav in:Xo û dê*
*Ew dê ye hem paya te ye*
*Xuşka te ye daya te ye***

**Tê gotin ku Seyda bi heft dilan dildarê kesekê ye, rast gelo?**

Rest e, ji dil dildar bû. Cegerxwîn dil nede, dê kî dil bide?

**Wek nav, wek agadariyekê..?**

Her du çûne rehmetê...em vê birînê nekolin,baştirr e.

**Kek Keyo, her helbestkar, nexasim yên navdar, bi qasî helbest û hunera xwe, bi evînên xwe jî nemîdar in. Û ev yek ne şerm e, ne jî guneh!Mesele helbestkarê tirk Nazim Hîkmet, yê Şîlîyî Nerûda, Mayakovskiyê Rûs...**

Dizanim, dizanim lê bila ev yek li halê xwe bimîne!

**Baş e, ji deqarûtî û hazircewabiya wî re tu yê çi bibêjî?**

Ji kesekî danedixwar...

**Ew mesela kêrê û şûxê Ereb?**

Bi serê xwe ye. Rojekê mêvan e li nav ereban. Dema ereb yekî/yekê biezimînin bangî heval û hogirên xwe jî dikin. Li bin konê erebî bavê min û şiyûxekî ereb li kêleka hev in. Hev zemberîşek/balîfek di navbera wan de heye.Yê ereb bihîstiye ku helbestvanekî kurd e, deqarû ye. Dixwaze biceribîne. Di kêlîkike sohbetê de, li bavê min vedigere û dipirse:Tu bi Xwedê kî, çi ferq di navbera kerê û kurd de heye. Bavê min, heftê nake heşt, bi tinazî"ev balîf e" dibêje ''di navbera te û kerê de!"

**Na xwe, ya ku li ser wî û axayê gund tê gotin jî, rast e?**

Ew jî bi serê xwe ye û gellek tiştên din..

**Kamîran Bedirxan di Hawarê de bi navê Seydayê Gerok nivîsiye. Ew gerok bû an bavê te?**

i helbesta wî dê bixweyê ku Başûr û Bakûr û Rojhelat...tevdaye. Demekê li Bexdayê dersdarî kir, li Şamê ma, li Beyrûdê... Hikumetê (ya Sûrî) derfeta ku derkeve derveyî Sûrî nedidayê. Destûr hebûya dê beşdarî gellek mîhrecan û konferansan bibûya.

**Belê, ji helbestên wî jî diyar in ku nekariye beşdari mihrecan bibe.**

Lê bi helbesta xwe beşdar bûye. Weke helbesta"Mîhrecana Berlînê'

**Taybetmendiyeke Seyda jî, belku bala te jî dê kişandibe, ji bilî zaravayê kurmancî bi soraniyeke fesîh, 30-40 helbest diyarî me kirine. Ez bi xwe ji dîwanên Seyda li zaravayê soranî warqilim. Ew jî wek**

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî
Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/index.php
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat: AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE

E - Mail:
agiri2003@hotmail.com
agiri2003@googlemail.com



## Li Hewlêrê, Semînarek Li Ser Navê "Parastina Ezmûna Herêma Kurdistanê Û Pirsgirêka Ewlehiya Netewî" Hate Lidarxistin




Lii gor agahiyên Navenda Nûçeyan a PDK Îranê, roja yekşem, 28.10.2007'an, li bajarê Hewlêrê, ji aliyê Kombenda Kawe bo Çanda Kurdî, semînarek berfireh li ser navê "Parastina Ezmûna Herêma Kurdistanê û Pirsgirêka Ewlehiya Netewî" bi beşdariya çendîn partî û saziyên Kurdistana, Bakûr, Başûr, Rojhilat û her wiha hejmarek ji kesayetiyên siyasî, rewşenbîr û navendên ragehandinê hate lidarxistin ku heya roja çarşem, 31.10.2007'an, dê dom bike.

Mijarên civînê eva bûn:

- Pêwendiya di navbera parastina ezmûna demokratîk û ewlehiya eyî a Kurdistanê.
- Girîngiya serkevtina ezmûna federalîzmê li Kurdistanê û bandora vê li ser bihêzkirina pirosesa siyasî li Îraq û pêşeroja guherînên demokratîk li herêmê.
- Fakterên hundirîn di tapokirina ezmûna Kurdistanê de.
- Bandora çareserbûna pirsa Kurd li çarçoveya Federalîzmê di Îraqê de, li ser çareseriya pirsa netewên din li herêmê.
- Dîtina rêçareyan ji bo betalkirina hêcetên welatên Îran û Turkiyê, derheq topbarankirina ser sînorên Herêma Kurdistanê bi hêceta hebûna PJAK û PKK'ê.
- Kurd xwediyê tu stratejiyekê ye? Gelo pêwendiyên netewî divêt çawa bin daku bûyerên li ser sînor ducar nebin?
- Gelo rêçareyeke yasayî di qanûna bingehîn a Îraqa Federal û Herêma Kurdistanê de heye ku tê de rê ji bo danûstandina tevî tevgera siyasî li parçeyên din ên Kurdistanê re vekirî bihêle û piştevaniyê ji demokrasiyê bike?

Hêjayî gotinê ye ku şandeke PDK Îranê jî ku pêkhatibûn ji birêz **Têmûr Mistefayî**, endamê Deftera Siyasî, **Rostem Cehangîrî**, endamê Komîteya Navndî û berpirsê pêwendiyên PDK Îranê li bajarê Hewlêrê û **Şaho Ferazmend**, endamê Rawêjkar ê Komîteya Navendî. besdarî vê civînî bûn.

## Amerîkayê Dorpêç Xistin Ser Spasha Pasdaran Wezareta Parastinê û Çend Bankên Dewletî Ên Komara Îslamî A Îranê



Di gaveke nû de, Amerîkayê dorpêç xistin ser Spasha Pasdaran, Wezareta Parastinê û çend bankên dewletî ên Komara Îslamî ya Îranê. Kondalîza Rays, Wezîra Karê Derve ya Amrîkayê ev yek roja pêncşem, 25.10.2007'an di konferanseke çapemeniyê de tevî Hênrî Palson, Wezîrê Xizînedariya Amerîkayê îlan kir.

Wê got: "Dorpêçên han bi sedema piştevaniya rejîma Îranê ji rêxistinên terorîstî li Îraq û Rojhilata Navîn, şandina mûşekan û hewildan ji bo bidestveanîna çekên Etomî, ji aliyê vê rejîmê ve, dimeşin".

Amerîkayê jê ve ye ku Sipaha Pasdaran di bernameyên navikî ên Îranê de, rasterast beşdariyê dike û taya wê a derveyî welat, çekan ji bo girûpên çekdar di Îraq û Efxanistanê de ji bo şer li dijî hêzên Amerîkayî, berhev dike.

Hêjayî gotinê ye ku zêdetir ji 20 navendên rejîmê ku pêkhatî ne ji, kesayetî, sazî, bank û her wiha şîrketên girêdayî bi Sipaha Pasdaran, dikevin bin dorpêçên Amerîkayê.

Eva cara yekemîn e ku welatek hêzeke fermî ya welateke din dixe bin dorpêçan û weke terorîst dinase.

## Jina Şaxdar



- Hiyalîng, jineke biemr a (95 salî) a welatê Çînê ye. di navçavên wê de tiştek bi şekl û rengê şax çê bûye. Wê li sala 2003'an, bo rêgirtin ji geşekirina wî şaxî, operasiyon jêre hatiye encamdan, lê heya niha ev şaxe li geşe û mezinbûnê de ye û dirêjahiya wê gihîştiye 12 CM û berdewam li geşekirinê de ye.

Niha kes û karên wê jina biemr, mijûlê komkirina pare(dirav) ne, bona wê ku neştergeriyê yan operasiyonek mezin jêre bikin û wê ji dest şaxê cihê herîmanê rizgar bikin.

## Jinek Bû Serok Komara Arjantînê




Di encama hilbijartinên roja yekşem, 28.10.2007'an, **Kirîstnîba Fernandêz Kireşner** serket û bû Serok Komara Arjantînê. Fernandêz 54 salî û ji partiya Çep a Navîn e. Wê karî 42 ji sedê a dengan bi dest bixe. Herwiha Kirîstîna Parêzer û Senator û herwiha hevsera Serok Komarê niha ê Arjantînê ye.

Eva cara yekemîn e ku jinek bi awayekî demokratîk li Arjantînê desthilatê bidest dixe. Berê jî di sala 1974'an **Opta Pron**, hevsera Serok Komarê wê demê, piştî mirina mêrê xwe, 2 sala Serok Komar bûye.

## Qeysî Û Taybetmendiyên Wê



- Li gorî lêkolînên lîkolînvanan, dewlemendiya Qeysiyê bi egera hebûna vîtamînên (A, B, C) ye û mifahek zaf dide mirov. Ji ber wê ku Qeysî mîweyek çalak e û di dema xwerinê de zû li mîde dihele.

Her wiha ji bo kêmxweriyê jî bisûd e û demaran bihêz dike û hez û xwesta xwerinê jî zêde dike. Qeysî ji bo zikçûnê jî gellek baş e û demaran aram dike.

Her wiha pêşgîrî ji areqekirina zaf dike, asta geşekirinê di zarokan de zêde dike,, ji bo bendbûnê(qebzî) gellek baş e.

Dr. Lokrîk dibêje: Xwerina Qeysiyê dermanê kêmxweriyê ye û her 100 giram ji Qeysiyê 45 ji sedê ya hewcehiya leş ji hêzê di rojekê de misoger dike.

Her wiha %8 ji vîtamîna C, %6 vîtamîna B û %3 vîtamîna B1 têde ye.

Ji ber wê ku Qeysî bi şekirê dewlemend e, tevî wê ku karîneke zaf bo pêşgirtin ji nesaxiyan heye, hevdem çav jî bihêz dike.

Xwerina Qeysiyê bo ew kesên ku werziş(sporê) dikinm gellek girîng e bo jinên pêgiran jî mifahek bêhesab heye.